

, li dergistiya xwe ya bedew digere nagere, wê nabîne...!! Kul û hesreta Aytenê di dilê wî de birîneke kûr vedike!!

Piştî reva wî ji girtîxanê, ji tirsî polîsan, ji STENBOLê jî direve, diçe bajarekî dûr ku nasekî wî lê rûdinişt, demekê li cem wî dimîne û dîsa vedigere STENBOL a wêran ji xwe re li karekî digere. Bi giranî û dilêşî, bi zikekî têr û didiwê birçî, şev û rojên xwe derbas dike, dike nake, tu karî nabîne. Dost û dilxwazên wî jê dixwazin ku ew vegere welêt nava xelk û merivên xwe, lê ew naxwaze vegere û her li karekî digere.

Piştî demekê, li cem Kurdekî weke şagirt dixebite, li kolanê siciqan di nava nên de dipêçe û difroşe, rojê 0.5 benqenotê distîne, pê debara xwe ya rojane dike. Lê mixabin, wê jî pir dirêj nekir, ji ber ku dostê wî dadigere welêt û careke din bêkarî, betalî, kul û derdên giran li Rustem dest didin!! Di gera xwe ya li karekî de, ew di glopeke şevê de, li cem camêrekî karê firotina çixare û çerezan dike, rojê 5 benqenotan werdigre, zû rewşa wî baş dibe, diravan jî dê û birayên xwe yên li gund re dişîne, li cihekî xweş û paqij, di hudirê glopê de radikeve, xwe dişo û vedişo, cil û kincên xweşik li bejin û bala xwe dike, pere û diravên xwe li ser hev datîne vedişêre. Di riya jineke pîs a bi navê Husniye Xanimê re dikeve dav û benda malbateke şêlanker î bê rewîşt û bê namûs...!! Bi hinceta ku keça xwe bidinê, ew bê bext wî talan dikin, pereyên wî bi tevayî jê dibin û berîka wî vala dikin, di wê navê re, karê wî jî ji dest diçe, perîşan û belengaz dibe, heroj cilekî xwe difiroşe pê zikê xwe têr dike û roja xwe derbas dike. Careke din, heval, dost û hogirên wî jê tika dikin ku vegere welêt, karê gundîtiyê bike, li dê û birayên xwe miqayît û bi wan re alîkar be, lê ew bi ya wan nake, berê xwe dide wê yekê ku leşkeriya welatê xwe Tirkiyê bike.

Di leşkeriya behriyê de, li aşxanê, ji 20 garsonan re dibe şêf, gelek bexşîş ji serbazan werdigre, diravan jî dê û birayên xwe re dişîne û rojên leşkeriya xwe bi xweşî derbas dike. Lê, tiştê dilê wî dêşîne ew e ku, name ji hemû hevalên wî re tîn, tenê ew di nav wan de bê name dimîne, wê yekê pir ew melûl û xemgîn

dike...!! Rebenê xwedê, ne dê, ne jî birayên wî xwendin û nivîsandina tirkî zanîbûn, da ku jê re naman bişînin.

Rojekê, hevaleyê wî nav û adreseya rojnameyêke Qibrisî jê re anî û jê re got, navnîşana xwe di vê rojnamê de belav bike biweşîne û bixwaze ku keçên Tirk ên Qibrisê ji te re naman bişînin, tê ji xwe re bi wan mijûl bibî. Wî jî wilo kir, vêca gelek qîzên Tirk ên Qibrisê jê re name şandin, yek ji wan jî bi navê Reyhan bû, Rustem û Reyhanê li ser pelan hevdu nas kirin, ji hev hez kirin û soza zewacê ji hev re dan. Piştî kutakirina leşkeriyê, Rustem rê digre diçe Qibrisê, dergistiya xwe dibîne û ji hev re dibine jin û mêr. Li wê derê karekî xwe dibîne û dixebite. Di wê demê de, şerê navxweyî di navbera Tirk û Romên giravê de derdikeve holê û rewşa wî pir xirab û aloz dibe.

Nivîskarê romanê, jiyan xelkên giravê ya wê demê bi zelalî dide xuyakirin, çawa ku belengazên Tirk û Rom bi biryara kedxwer û nemerdên herdu gelan hevdu dikujin û ew berpîrsên bêbext û xwînaxwer mal û mewanên herdu gelan didizin û ji xwe re diravan di bangan de kom dikin. Di vî warî de Rustemê mirovhez û hesteyar li dijî kuştina mirovan derdikeve û weha diqîre û dibêje:

**"Keko ez mirov im, di xurist û pirtûka min de mirovkuştin tune. Ez naxwazim bibim têkoşer mirovan bikujim, berî her tiştî, ez bi xwe jî mirov im, xudan komek zar û zêçan im. Ew kesên ku di herdu aliyan de tene kuştin, hemû mîna min û te ne. Jiyan xweş e, mirin û kuştin çi re?! Çi re mirov here xwe bide kuştin an jî kesekî di bikuje?!...Divê her mirov li heya dawîya jîna xwe bijî, neyê kuştin û kesî nekuje, şer û kuştin şerma mirovatîyê ne!!.."**

Ji ber helwesta wî ya mirovane, navbera Rustem û rêxistina tirkên Qibrisê xirab dibe, berpîrsên rêxistinê wî dixine bin givaşê û jê dixwazin ku zûtirîn dem ew ji giravê derkeve û vegere welatê xwe Tirkiyê. Ew bê çare dimîne, bi destê jina xwe Reyhanê û herdu keçikên xwe yên piçûk digre, piştî xwe dide felekê û berê xwe dide oxirê, di demeke nêzîk de, careke din, li Stenbolê cîwar dibe.

**09.04.2011Z-2623K**